# DENGÊ KURD

12 Newroz 2713 k 01-04-2013 z DENGÊ KURD -Hijmar (5) www. Pdksp.org


# LIVLIVÎNA ŞOREŞGÊRÎ KETIYE QEYRANÊ




## BERJEWENDÎ

Bûyer li pê bûyerê û qewman li ser qewmanê, şoreşa Sûryayê tengezar û zîz dibe li Gorepana kiryaryên çekdarî û hevpeyvînên siyasî bê ko tu alîgir dikaribe serkeftinê bidest xwe ve bîne, û wisa rijêm û dijberî li himberî gelek asteng û kosp û rêkaşan rawestiyane, lê tiştê herî giring û balkêş ewe: ka berjewendiya gelê perêşan û azarkêş û qurbanbar kî jê re dixebite?! Yan kî wê berjewendiyê diparêze ji nav lepê wêran û pîlangêriyên navxoyî û navherêmî û navnetewî. Berjewendî bi gelek cor û terz û şêwaz tê naskirin, heye berjewendiya kesokî, û heye berjewendiya partîxwazî, û heye berjewendiya giştî. Gelo ka dijberiya Sûryayê bi giştî û tevgera Kurdî bi taybetî di warê parastin û bergîriya kîjan berjewendiyê de ne? Gelo ji kîjan berjewendiyê re kirin û dikin? Wa diyare bi dirêjahiya her du salên şoreşê re ko dijberî û tevger ne di astê berjewendiya giştî de ne, û girovê menî berdest û serdest ewe ko hîna nakokî zorin û tevlihevî serbest û belûne, wa diyare ko berjewendiya taybet gulbijêre di karnameya rojevê de. Ev diyarde tiştekî seyre û şermsarî û navnotiyê tîne dadgeha berpirsiyariyê.


2 « BI XWEDÊ EŞQA WAN KETIYE DILÊ ME


3 « DORPÊÇKIRINA EFRÎNÊ Û ASTENGÊN ABORÎ

3 « NAVENDA YASA LI DÊRIKÊ MÊVAN BÛ

4 « TÎRÊJ DI SALVEGERA YAZDEMÎN DE SAX BÛ

# Bi Xwedê Eşqa Wan Ketye Dilê Me

M.Emîn Sadûn



Di baweriya me de, gelê kud li Rojavayê kurdistanê û nexasim Partiya Demoqrata kurd li Sûriyê (partî ) dema bawerî bi vê rêbazê anî, ne ji ber berjewendiyên xwe yên taybet pêk bîne,tevî em dizanin ku pêvajoya xebatê tucarî ji mirovên keysbaz û berjewendperistan bê bar namîne, lê her kesê bi bext di zanê ew bawerî ji ber pêkanîn û parastina berjewendiyên bilind yên gelê kurd û armancên şoreşa kurdî bûn, ew şoreşa ku îro gelê kurd li başûrê kurdistanê bi berhemên wê şadibe. Îro tiştin hene divê mirov bêje, hinga partiya Demoqrata kurd li Sûriyê (partî) bawerî bi rêbaza Barzanî anî û pêgirî bi rêz û rêwazên wê rêbazê kir, û bi xurtî û eşkere berevanî di ber de kir, hingî Kurdistan û mafê gelê kurd xewin û hêvîn nazik bûn, di dil û canê netewperwer û dilbêşên kurdewariyê de dijenîn, hingî ne zerfên Dolaran hebûn û ne jê otêlên pênc sitêrik li kurdistanê peyda dibûn . miletê kurd û pêşmergên kurdistanê tev dizanin û dîdevanin li ser wê serdamê, dema zikekê têr û dehê pirçî bû, dema cil û bergên sipeh û pînekirî bû , hingî û di wê demê de gelê kurd li Rojavayê kurdistanê û bi serweriya partiya Demoqrata kurd li Sûriyê (partî ) bawerî bi vê rêbaza pîroz anî û ma berdewam li ser wê rêbazê û ji ber pêgirî û piştevaniya di ber wê rêbazê de gelek serkird, endam, layingir û heskerên partî û aşiqên vê rêbazê derd û êş kişandin û partî jî rastî gelek parçebûn û jihevketinan hat,lê îro ew rêbaz bi serketiye û bayê buhara wê serî hildaye, nema ne neyarê kurdan dikarin û ne jê simsar û dûvelankên wan dişin deryên xwe li ber vî bayî bigirin û ji derveyî wî bayî bijî. Mixabin guneheke mezine îro mirov xwe bi bînê zana û rewşenbîr û bi xwazê dîrokê berovajî bixwînê,lê ev yeke ne nû ye,ji ber dema Kurd û partiyên kurdî parçebûn, ewan mirovan zimandirêjî dikirin, û bi daxwazin derewîn hêstir li ser rêk û pêkkirina navmala kurdî ,û hevgirtin û yekîtiya kurdan dibarandin, va dema ku îro kurd ber bihevtên û dibin yek jî, her dîsanê wan hêstirên derewîn bi xwe dibarînin, ma ev çi ne û çi ji kurdan di xwazin ??? gelê kurd zana û hişyar bûye, û rêya çareserkirina xwe li ser rêya pêşewa û serwerên xwe naskirye, guh nade kesên rêwenda û ji rê ketî, û baş di zane ku ew mirov nexweşin, dilgemar û zikreşin, xortên kurda nema ji diranên wan yên qîç û ramanên wan yên pûç ditirsin, ji ber ew mirov dûr yan nêzîk wê di gola gerava gemarî û zikireşiya xwe de bifetisin

# Livlivîna şoreşgêrî li Rojava yê Kurdistanê çi lê hat?

loloxan

Şoreşa Sûryayê wekû hate pênasîn şoreşa azadiyê û rûmetêye, ew şoreşa ko hate vêxistin û dadan bi lêdan û binpêkirina laş û keyferata zarûzêçên (Dera'a)yê, û li paş re belav bû li hemû bajar û bajarokan di bin serkutkariyên destdirêj û kînvekêş ya rijêma Esed, û wisa roj bi roj şepêlên bûyer û qewmanan zortir û bêhtir bûn, û Kurd bi hemû qatûçînên xwe ketin nava rêzxankên şoreşê, û livlivîna şoreşgêrî xistin karnameya rojevê, wisa helwêst û pêşbîniyên xwenî welatparêzî û netewperwerî tomar kirin li gorepana siyasî, çi li astê navxoyî û çi li astê navherêmî, û hino hino li astê navnetewî. Livlivîna şoreşgêriya Kurdî di destpêka şoreşê de gelekî gûr û gurîx bû, lê hino hino lawazî û sistiyê xwe berda nav û hinavên hevrêzên gencên Kurd û kolana Kurdî bi tevayî, û ew jî vedigere bi bal sê rehendên siyasî ve:

1- nehebûna sitratîciyeka netewî ya Kurdî li astê tevgera rizgarîxwaz û wisa li ser astê bingehîn bi tekûzî, û nehebûna karnameyeke siyasî li ser astê rojeva şoreşê, û nelihevkirina hevrêzên genc û lawan digel tevgera rizgarîxwaz de li ser astê yekbûna gotara siyasî, ev nakokiyên cudacuda tevliheviyên bê bend û sînor çêkirin, û li paş re xemsariyek di livlivînê de meyand.

2- tênerîna şovînî û nejadperestî ji bal dijberiya Erebî ve bi bal kêşedoza Kurd ve ji alîkî ve, û ne amadebûna wê dijberiyê ji pesendkirin û pejirandina tevgera rizgarîxwaza Kurd re di nava rêzên xwe de wekû karnameyeke welatparêzî û alîgirekî şoreşgêr xwedî helwêst û armanc.

3- helwêstê navnetewî yê ko hate naskirin roj bi roj bi qelsî û lawaziya xwe dijî rijêma Esed, û nehebûna rastûronîtiya welatên zilhêz di sitandina biryareke serbest û serdest de dijî rijêmê, û paş re pirbûna kongireyan li paytextên cudacuda û hevdij û pir nerîn, û wisa piştvaniya Rûsya û Çînê bi vîtoyan ji rijêmê re. Ev her sê rehend bi tevayî karîgeriyên xwenî taybet hebûn û hene li ser livlivîna şoreşgêriya Kurd digel çend hokarên xomalî û derdorî, wisa hiştin ko lawazî û sistî xwe berde nav û hinavên çalakiyan û wisa em dibînin ko dîmen û kevalên şoreşgêrî pirtûBelav dibin, û kurd li himberî pirsyareke zor balkêş û metirsîdar rawestiyane: gelo ka emê çi bikin?!.



www.marsiyakurdi.org

# Dorpêçkirina Efrînê Û Astengên Aborî





Mistefa Minle

Bê gûman gava em bixwazin hinekî li ser rewş û xebata gelê me yê Kurd di rojavayê Kurdistanê de rawestin, pêdviye em behs û şirovekirina şoreşa Sûrî jî bikin. Ji ber dirêjkirina vê şoreşê ku du sal derbas kiriye, gelê Sûrî qeleneke giran dide, ji kuştin, talankirin û wêrankirinê. Li kêlek û nûk vê bûyeran dewletên mezin û cîhan ew jî ketine çopemendî û bataqekê nikarin jê derên, û çareseriykê ji rewşa gelê Sûrî re bibînin. Di bin bandor û sîha vê şoreşê de wek em Kurdên rojava jî di roja yekem de me xwe didît ku em beşekî sereke ne di vê şorşê de. Kurdan li dirêjahiya çel salî li dijî rêjîmê kar û xebata xwe dikir, û qelenên azadî û demoqrasiyê bi tenahiya xwe di bin destlata rêjîma behis ya şoven û dîktetor dedidan. Vêca herêma Efrînê yek ji wan herêmên Kurdistanarojava ye, ku ciheke wê stratîcîk di bakurî Sûriyê deheye, lewre jî rêjîmê di qonaxên çûyî de dixwast Efrînê ji herêmên Kurdan yên dî biqetîne, mîna Qamişlo û Kobanê, û têkliyên awarte pê re dikirin bo helandin û heriftina Kurdên Efrînê di çarçewa netewa Erebî de. Ji ber vê yekê rêjîma şoven û dîktetor di destpêka şoreşa Sûrî de bi destekî hesinî, bi hêz û bendewariya xwe xistibû herêma Efrînê, ji bo Kurda ji vê şoreşê bi dûrxîne, lê zixt di çavên wan de bin, hêviyên rêjîmê bi cih nehatin, û di pêlanên xwe yên qirêj deneçûn serî. Lê îroj wek xuya dibe herêma Efrînê bêtirî herêmên dî, di rewşeke aborî û jiyarî de pir dijwar û cetin derbas dibe, û ketiye koşake teng, bê êliktirîk û ragihandin, dûrî xelkê cîhanê tev de ye, tevî ku piraniya mal û xelkê me yê Kurd ji bajarên mezin hatine ( Heleb, Şam, H.W.D) koçbar kirine Efrînê, wan jî bargiraniyeke du milî xistine ser milên mirov û gundiyên xwe, bê yî ku ti kar li pêşiya wan jî hebe. Bi gelmperî rewşa jiyana rojane ku gelê me yê Efrînê tê de dijî di çûlekî xerab û çepel de jiyan û demên xwe diborînin, tûşî sêfîlbûn û biRçîbûnê dibin, ji ber vê yekê pirsa ku xwe ferzî ser holê dike ev e, çima bidûrveke xwe yî taybet Efrîn di rewşeke weha de dijî, sedemên wê jî gelek in, ji ber herêma Efrînê hatiye dorpêçkirin ji aliyê pir hêzan ve, sedemên wê jî ev in:

1- Herêma Efrînê bi sînorekî pir dirêj hatiye girêdan bi Turkiyê ve. lewmaTurkiyê pir dorkêş e, ku sînora xwe bi parêz e û TEkûz bike û her tiştekî bernade herêmê, ji ber dibîne ku herêm di bin bandora P.Y.D. de ye.

2- Dorpêçkirina Helebê û gundewarên wê ji aliyê rêjîma Sûriyê ve, ew jî sedemek e, ku Efrîn di astengeke aborî mezin de ye.

3- Ji ber têklyên herêmê bi sînorên herêmên Ereban ve girêdayî ye, mîna (Ezaz û Sem'an), ku ew di bin desta artêşa azad de ye, ji ber wê pir caran nakokî di navbera wan û P.Y.D de çêdibin, vêca artêşa azad rê û baziganiya aborî dibire.

4- Ji ber dûrbûna Efrînê ji Kurdistana başûr, alîkariyên hawarkariyê jî bi hêsanî nagihîne Efrînê.

# Navenda Yasa mihvandariya bajarê Dêrikê dike

Bilind mela – Dengê kurd

Navenda kurdî ji bû lêkolîn û rawêjkariyê – yasa – ya ko cihê wê li dewleta Elmanya ye , xulek ragehandinê di sê rojan de bû rojnamevanên rêxistinên siyasî û desteyên civaka sivîl û çalekvanan li bajarê Dêrikê ji roja 13 ta 15 /3/2013 z de li holên peymangeha Bedir xan a zimanê kurdî hate li darxistin. Mijarên vê xulê li ser Pêgihandin û bandora ragihandinê li ser civakê . û mebest û armanca vê xulê ji bo pêgehandina kadirê di warê rojnamevaniyê û dezgehên ragihandinê de kar dikin . û pêkhatina rojnamevanekî şareza û pispor di warê ragihandinê de , û alîkariya hemî piroseyên nûçeyan û diyalogê , û tekezkirin li ser şêweyê kar kirina di warê êzgehê de ,û ev xule bi şêweyek şarezayî û ekadîmî hate li derxistin. Mehemed Mîro endamê navenda Yasa diyarkir û got : em tîmekî serpereştî ne ji Elmaniya ve hatine bo alîkariyê bidin ewan kesan yên di warê ragihandinê de kar dikin , û bingehek mikum dirust bikin di xizmeta ragihandinê de , her wiha Mamoste Mehemed Mîro diyarkir kû Yasa bernameyek heye bo çend xulên dîtir werin danîn li bajarê Qamişlo û Kobanê û Efrînê piştî dûmahîka vê xulê. Her wiha şazde kes yên xemxur û karmendên di warê ragihandinê de ji deste û komelên civaka sivîl û partiyên siyasî divê xûlê de beşdarî bûn , Hêjayê gutinê ye ev xule hate pêkhatin bi rêya Encûmena navçeyî ya encûmena niştîmanî ya kurdî , û peymangeha bedirxan , û bi serperştiya herdû endamê navenda Yasa ( Mamosta Mehemed Mîro û Mamosta Arif Cabo ) yên ko ji dewleta Elmaniya ve hatine bo rêveberiya van xula saz bikin di Rojavayê kurdistanê de .



# Ahenga Newrozê li Holenda bo alîkariya Rojavayê Kurdistanê

Nûnergeha Encûmena Niştimanî ya Kurdî ya Rojavayê Kurdistanê li Holenda xelkêd Kurd vexwend bo ahenga cemawerî xêrxwazî ya ko wê bête gêran li bajarê (Otrîxt)ê, bi beşdariya çendîn sitranvanên Kurd. nûnergehê anî ziman ko bêşberiya vê ahengê wê bête terxankirin ji bona koçberên Rojavayê Kurdistanê. Ev aheng hate gêran di sersala Kurdî de bi deng û rengê evan sitranvanan (Ebas Ehmed- Zubêr Salih- Kanîwar- Evîna Welat- Luqman Cemîl- Şêro Betê- Kerîm Şêxo- Zuhêr Cemîl- Diyarî- Ceger). Û paşî gêrana vê ahengê pêşankariyek cilûbergên Kurdî hate lidarxistin û di nav re çend mizgîniyên dilgeş hatin nagihandin.




# Seydayê Tîrêj Di Salvegera xwenî Yazdemîn de



Ibrahîm Ebdî

Nayifê Heso yê ku bi naznavê Tîrêj dihate naskirin, di sala 1923an de li parêzgeha Hisiça-gundê (Nicîm) hatiye dinê. di dibistana olî de dest bi xwendinê kirye. di sala 1937an de çûye Amûdê û li wê derê Pênc salan li dibistana wê xwendiye. Lê ji ber mercên aborî xwendina xwe nedomandiye. têkiliyên wî bi helbestvanên mezin re mîna Cegerxwîn, Qedrî can, Hesen Hişyar re çê dibin. Û di bin bandora wan de dest bi ristina helbestê dike. Seydayê Tîrêj, li ser şop û rêya helbestvanên helbesta Kilasîk ya resen helbesta xwe ristiye. Seyda helbestvanekî xwedî girşanek xurstî bû di ristin û hûnadina helbestê de, herdem gotin û peyvên sade û zelal bikar dianî, da ko guhdêr û xwendevan di watayên wînî helbestî de bighêjin, pirtirîna babetên wî welatparêzî bûn, lê gelek caran efsane û çîrokên dîrokî dixistin karmendiya helbestê da ko bighêje merem û mebesta xwe ya serekî. Seyda, di bîr û baweriya xwe de li ser rêbaza Berzanî bû. Û di nav rêzên Partî de kar dikir. Berhemên wî yên çapkirî ev in:( Xelat -Zozan-Cûdî-Serpêhatiyên Kurdan(1). Berhemê wî yên ne çapkirî ev in: (-Mûlida Kurdmancî. - çend helbestên destnivîs -Serpêhatiyên Kurdan(2)) Seydayê Tîrêj di 23-3-2002 de çû ber dilovaniya Xwedê.

# HERDÛ PEYMANGEHÊN ZIMANÊ KURDÎ Û KARÊ HEVBEŞ (BEDIRXAN Û NESRIDÎN)

Bi amadebûna kargêrê peymangeha Bedirxan ya zimanê Kurdî mamosta M. Emîn Se'dûn li Dêrikê û berpirsyarê komîteya rewşenbîrî û ragihandinê ya Partî M.Salih li Girkêlegê, dîdareke karxwazî hate lidarxistin di navbera kadirên fêrkariya Kurdî de ji herdû peymangeha re jibona birêvebirina xebata fêrkarî û alûgorkirina pesporiyan û çareserkirina gîrûgiriftên ko bûne asteng li pêşiya xebatê. Têzanîn ko peymangeha Bedirxan serperiştiya çel gundî dike di warê fêrbûn û kargêrana zimanzanînê de, û wisa kargêr tekez kir li ser pêdiviya veberanîna şiyanên Kurdî yên peydakirî ji bo amadekariyê ji qonaxa dahatî re, ya ko pêşdestiyên wê serê xwe hildane, û li paş re fêrkaran bîrûboçûnên xwe dan xuyanê da ko astê zimanê dayikê pêşkeve û payebilind bibe di vê qonaxa hestyar de, û li dûmahîka dîdarê biryar hat sitandin ji bal herdû peymangehan ve bo çespandina komîteyek bidûvdeçûnê ji bo hevtêkelî û alûgorkirina tênerînên ciyawaz.



# Pişkûrîna xewndegeha zimanê Kurdî li (Banê Şikeftê)

Helmeta pişkûrîna xwendegehên zimanê Kurdî berdewame li devera Dêrikê, di nava rêzbenda kar û çalakiyên peymangeha Bedirxan de, li roja 15-3-2013 pişkûrîna xwendegeha zimanê Kurdî li gundê Banê Şikeftê lidarket bi amadebûna kargêrê peymangeha Bedirxan û kesûkarên gund û rêxistinên tevgera Kurdî û nasyarên deverê. Paşî pişkûrînê çendîn gotar hatin xwendin, tekez kirin li ser giringî û rola ziman jibo parastina netewa Kurd di hemû qonaxan de, û nexasme îroroj. Ji rexekî dîtir ve gotaran anî zimên ko ziman hokarê tekûzkirina rêzxana kurdî ye di vê qonaxa hestyar de, bi komkirina hemû şiyanan bo çespandina mafên netewî ji gelê Kurd re, û peydakirina rêbîr û seqayê guftûgo û hevtêgehînê bo çareseriya hemû nakokiyan li deverê. Li dûmahîkê koma Serhed ya hunerî çend kevalên hunersazî pêşan kirin.

